SECTION 8
KÛPON

Kirêdar: Mafên Xwe Bizanin!

Her çend deynê we yê kirêyê hebe, hûn kûpona xwe winda bikin an kontrata xwe ya kirêyê xera bikin jî, xwediyê xaniyê we NIKARE:

- Kilîda derî biguherîne da ku hûn ji xanî derkevin
- Tesîsatên we bigire (kareba, av, gaz)
- Eşya û tiştên we biavêje derve berî ku şerîf were

Heke ev tişt werin serê we, têkiliyê bi Şêwirmendê Mafê Tehliyeyê re daynin.

Kûpona Beşa 8an çi ye?

- Kûpona Beşa 8an "**alîkariya xaniyan**" e ku li şûna daîreyekê bo kesekî (**xwediyê kûponê**) tê dayîn. Ger hûn bar bikin, hûn dikarin **kûpona xwe bi xwe re bibin.**
- Heger kûponeke we hebe, hûn ê **ji sedî 30ê dahata mehane ya malbata xwe** bidin kirêya xwe. Hikûmet dê ferqa di navberê de temam bike û her meh kirêya mayî jî bide xwediyê malê.
- Carinan, di avahiyan de tiştekî bi navê "**Beşa 8an a li ser esasê projeyê**" heye. Ev subvansiyoneke xaniyan a cihêreng e ku li şûna kesekî bo avahiyê tê dayîn. Ger hûn ji kompleksekeBeşa 8an a li ser esasê projeyê **derkevin**, subvansiyon **dê bi we re neyê.**
- Her xwediyê Beşa 8an beşê xwedî **peywirdarekî sosyal** e. Piştrast bin ku hûn yê xwe dizanin!

Berpirsiyariyên min têkildarî Beşa 8an çi ne?

- **Di nav 60 rojan de yekîneyekê peyda bikin.** Xwediyên xanî ne mecbûr in ku Beşa 8an qebûl bikin. Ji bo demeke bêtir, daxwaza dirêjkirinê ji bîr nekin **berî ku** kûpon biqede!
- **Her sal û her gava ku mezinahiya şêniyên malbata we an dahata we diguhere ji nû ve sertîfîka bikin.** Belgeya dahata malbata xwe bidin peywirdarê sosyal ê Beşa 8an.
- **Her meh qismekî kirêya xwe bidin.** Ji peywirdarê xwe yê sosyal re bibêjin ger dahata we biguhere - dibe ku ev rewş bandorê li kirêya we bike! Formên pesend û verastkirinê yên pêwîst **îmze bikin.**
- Kirênameya xwe binpê **NEKIN,** cihê xwe ne tendurist/ne ewledar **NEKIN** an jî tiştekî xeternak nekin/gefa kirinê nexwin. **Mêvanên we jî daxilî vê ne.**
- Tamîrên pêwîst tavilê **bi nivîskî ragihînin xwediyê xaniyê xwe û peywirdarê xwe yê sosyal.**

LEGAL AID SOCIETY (833) 837-HOME
NHBA (615) 701-7957
AMAC (615) 988-6460
NASHVILLE CONFLICT RESOLUTION CENTER
ROOFTOP NASHVILLE

Ev agahdarî tenê ji bo Davidson County ye. Agahiyên li vir hatî dayîn armanc nake ku pêşniyaza qanûnî pêk bîne. Heke pirsgirêkeke we ya hiqûqî hebe, ji kerema xwe telefonî parêzgerekî taybet bikin an telefonî Komeleya Alîkariya Hiqûqî ya Middle Tennessee ya herêmî bikin an jî bi riya hejmara 1-800-238-1443 telefonî ofîsa Cumberlandsê bikin an jî bi riya hejmara 1-615-701-7957 telefonî Yekîtiya Baroyan a Nashville Hispanîkê bikin. Di 5/24an de hat revîzekirin.

SECTION 8
KÛPON

Kirêdar: Mafên Xwe Bizanin!

Beşa 8an kengê dikare hewl bide ku kûpona min bi dawî bike?

Hûn dikarin tenê ji ber **SEDEMEKÊ (ji ber sedemeke spesîfîk)** kûpona xwe winda bikin. Bo nimûne, di rewşên jêrîn de dibe ku hûn rûbirûyî xetereya windakirina kûpona xwe bimînin:

- **Binpêkirinên Bernameyê.** Heke hûn dahata xwe û kesên di mala xwe de ranegihînin, ziyanê bigihînin xanî an gefxwarina/kirina tiştekî xeternak an derqanûnî dikarin bibin sedema tehliyeya we ji xanî.
- **Kontrolên Neserkeftî.** Ger xwediyê xanî di maweya ku ji hêla Beşa 8an ve hatî destnîşankirin de tamîratan neke, pêwîst e ku hûn kûpona xwe veguhezînin xaniyekî/yekîneyeke nû. Ger hûn di nav 60 rojan de cihekî bo mayînê peyda nekin, hûn dikarin kûpona xwe winda bikin. Heke hûn nikaribin cihekî peyda bikin, **berî ku** maweya kûpona we biqede bi nivîskî daxwaza dirêjkirina dema wê bikin.
- **Neberdewamiyên Demdirêj.** Ger hûn ê zêdetirî 14 rojan ji mala xwe dûr bikevin, bi awayekî nivîskî ji xwediyê xanî û xebatkarê civakî yê beşa 8an re ragihînin. Bi zelalî diyar bikin ku hûn yekîneya xwe **na**terikînin û ji wan re ragihînin ka çima û heta kengê hûn ê ji mala/yekîneya xwe veqetin.

Çi diqewime eger kûpona min bi dawî bibe?

Berî ku alîkariya we bi dawî bibe, mafê we heye ku hûn bi Beşa 8an re rûniştinekê bikin. Ji roja li ser belgeyê nîşankirî ya ku tê de bidawîbûna kûpona we hatiye diyarkirin û şûn de, di nav **10 rojan** de, daxwaza **civîneke "şikayetê"** bikin.

- Her **delîl** an **agahiya** têkildarî pirsgirêkê bi xwe re bînin civîna gilîkirinê.
- Civîna we ya yekem dê bi gelemperî civîneke **nefermî** be. Ger hûn nikaribin pirsgirêkê li wir çareser bikin, hûn dikarin bi gelemperî daxwaza rûniştineke **fermî** bikin.
- Ger hûn Beşa 8an winda bikin, hûn ji **%100**ê kirêyê berpirsiyar dibin. Ger hûn nikaribin kirêyê bidin, dibe ku xwediyê xanî hewl bide ku we **derxe**.
- Tevî ku hûn kirêya xwe dereng bixin jî, xwediyê xanî **nikare** kilîda we biguherîne an we ji xanî biavêje. Divê pêşî we derxin **dadgehê**.

Ger kaxezên dadgehê ji we re bên, BIÇIN DADGEHÊ!
Heke hûn vê nekin, hûn ê bi awayekî otomatîk winda bikin.

Ez kengê dikarim bar bikim bêyî ku kûpona xwe winda bikim?

Piştî ku kontrata kirêya we qediya, heke hûn **agahdariya nivîskî** bidin xwediyê xanî û peywirdarê sosyal ê Beşa 8an, hûn dikarin bi kûpona xwe bar bikin.

Tevî ku we tamîratên pêwîst **bi nivîskî** ragihandin xwediyê xanî û peywirdarê xwe yê sosyal lê xwediyê xaniyê we dîsa jî ew çareser nekirin, divê Beşa 8an wan bi nav bike. Ger xwediyê xanî dîsa jî piştî vê yekê tamîratê neke, divê hûn karibin tevî kûpona xwe bar bikin.

Ev agahdarî tenê ji bo Davidson County ye. Agahiyên li vir hatî dayîn armanc nake ku pêşniyaza qanûnî pêk bîne. Heke pirsgirêkeke we ya hiqûqî hebe, ji kerema xwe telefonî parêzgerekî taybet bikin an telefonî Komeleya Alîkariya Hiqûqî ya Middle Tennessee ya herêmî bikin an jî bi riya hejmara 1-800-238-1443 telefonî ofîsa Cumberlandsê bikin an jî bi riya hejmara 1-615-701-7957 telefonî Yekîtiya Baroyan a Nashville Hispanîkê bikin. Di 5/24an de hat revîzekirin.